

Wek Kedkarên Xizmeta Tenduristî û Yekitiya Bijîşkên Tirkîyê;

Me Ji bo mafên tendûristiyê, mafên jîyanê, tendûristiya gel rastiyên zanistî çî ne bêyî şerm bikin gotiye. Niha jî em gotina xwe berdewam dikin. Em Ji bo tendûristiya civakî ji zanistiyê û ji zanyara bawer dikin. Di şert û mercên heyî de amurên herî girîng ya tekoşîna bi COVID-19 de Aşîye. Li Tirkîyê ji bo ku em bi şewbê ra serî bikişînin bendava krîtîk a tê hesabandin aşîbûna herî kêr 85% ê nifûsê ye. Bi gotineke din, ji bo Tirkîyê, divê kêrê 75 mîlyon kes bi dozêk duçarî werin aşî kirin. Emê hewl bidin tiştê ku em di derbarê Aşîbûnê de dizanin li gorî berpîrsiyariya ku ji hêla civak û xebatkarên tenduristiyê ve ji me re hatî dayîn, bi we re parve bikin.

Em bi Aşîyê bawer in, Hûn jî bawer bikin. "Du Dil Nebe Aşî Bibe"

- ➡ Di tu Aşî ku ji bo COVID-19'an hatî erêkirin de û xebatên wan ên Faz-3'yan didomin de vîrus bixwe tune ye. Di Aşîyên neçalak (înaktîf) de vîrusên ku hatine bêbandorkirin, di Aşîyên din da jî bi proteîna rûxar a armançgirtî ya ku bexşangiyê çalak dike tên bikaranîn. Ango bi Aşîyê nexweşî ténagerê we.
- ➡ Her wekî hemû Aşîyên, bandorên neyênî yên van Aşîyên jî hene. Bandora neyênî ku herî zêde tê dîtin jî êşa mil a demkurt e (ji rojekê, du rojan zêdetir najo). Di van Aşîyên ku li qadê ji du mîlyar û nîv mirovan zêdetir kesan hatine xistin tu bandoreke neyênî ya ku metirsiyeke giştî çêbike nehatiye dîtin. Berovajiyê vê yekê, bandorên Aşîyên yên ku piştî pêketina COVID'ê derdikevin holê digihîjin asteke xeternak a ku gefan li jîyanê dixwin.
- ➡ Bandorên neyênî yên ku têkilî di navbera wan û Aşî de tên dîtin gefan li jîyanê naxwin û tên birêvebirin. Anafilaksiyê ji %1'an kêmtir e. Ji van bandorên neyênî Nexweşîyê bi xwe zêdetir xetere ye û gefan li jîyanê dikê.
- ➡ Heke alerjiya we hebe jî, ev li ber bûyîna Aşîyê mRNA'yê yan jî Aşîyên dine yên COVID'ê ne asteng e.
- ➡ Ciwanbûn we ji nexweşî û encamên wê yên xerab naporêze. Di tevahiya temenên ku hatine erêkirin de di be Aşî bîn kirin.
- ➡ Di destpêka ducanîbûnê de Aşî dikarin bîn kirin. Lê ji ber ku herî zêde di serdema pêşîn a ducanîbûnê de zarok ji ber dayîkan diçin, ji bo ku têkiliyek di navbera vê yekê û parzabûnê de neyê danîn, kesên ducanî dikarin 12-16 hefteyan ji bo parzabûnê bisekin. Bi taybetî parzabûna di serdema sêyemîn a ducanîbûnê de gelekî girîng e.
- ➡ Tu fikareyeke Aşîbûna ya di dema mêjandinê de nîn e. Divê mêjandin jî bê domandin.

- ➡ Aşî nabin sedema nezayokiyê. Li gor xebateke ku hatî kirin, parzabûn bandoreke neyînî li ser kalîteya meniya mêr nake, tew hinek bandorên erênî jî hatine dîtin.
- ➡ Aşîyên mRNA'yê nabin sedema guhartina genetîkê. mRNA'ya ku ji bo Aşîyê te bikaranîn di seatan herî zêde di rojan da tê tune kirin.
- ➡ Piştî Aşîbunê heke ku pêdivî pê hebe, di bikaranîna êşbir û dermanên daxistina agir de tu fikare tune ne.
- ➡ Piştî bikaranîna parzayên mRNA yan jî parzayên înakîf tromboz (kesekîbûn) nehatiye dîtin. Tu feydeyeke bikaranîna aspirîn an jî dermanên ku xwînê ruhn dikin ji bo kesekîbûnê tune ye. Lê, heke ku hûn ji bo nexweşîneke din bi kar bînin, divê hûn bikaranîna wan dermanan bidomînin.
- ➡ Piştî Piştî Aşîbunê, tu fikareyeke serşûştinê yan jî ketina zeryayê nîn e.
- ➡ Tê zanîn ku kişandina titûnê dikare bibe sedem ku nexweşî zêdetir bandorê bike. Her wiha, titûn dikare bandorkeriya parastina ku bi Aşîyê bê bidestxistin jî kêr bike. Lê ev rewş, bi şertê ku careke din neyê kişandin, piştî cixareya dawîn bi 20 deqeyan berovajî dibe, vediguhere.
- ➡ Aşîbun nabe sedem ku testa we ya PCR'ê pozîtîf derkeve.
- ✓ Kesên ku nexweşîyên wan ên romatîzmal hene, yên bi pençeşêrê ketine, yên ku nexweşîyên wan ên norolojîk hene û nexweşîyên wan ên têkildarî pergala bexşangiyê hene divê bîn parzakirin.
- ✓ Tevahiya dermanên ku ji bo nexweşîyên heyî tên bikaranîn divê beriya yan jî piştî Aşîbunê jî bîn bikaranîn.
- ✓ Tekane rewşa ku li ber Aşîbunê asteng e alerjiya ji nişka ve ya ku piştî parzabûnê bi çend deqeyan pêk tê û pêdivê bi destwerdanê heye ye.

Aşîbun Rêya Herî Ewle, Herî bi Bandorker û Herî kêr lêçûn a Parastina We û Hezkiriyên We Ye!
Ger hûn Dixwazîn Bijîn û bidin Jîyandin Du Dil Nebe Aşî Bibe.

Ji bo Zêdetir Agahî: Aşîbûna COVID-19 û Pirsên Pir tene Pirsîn
https://www.ttb.org.tr/makale_goster.php?Guid=6dc46898-d802-11eb-9450-8a9f7b8c4cda



TÜRK TABİPLERİ BİRLİĞİ

SAĞLIK VE SOSYAL HİZMET
EMEKLİLERİ SENDİKASI

